

JİN DERGİSİNDE TARİH YAZIMI: BİR MİLLETİN KÖKLERİNİ ARAMAK

LI PEY KOKA NETEWWEYKÊ: DÎROKNÛSÎN DI KOVARA JÎNÊ DE

SEARCHING FOR THE ROOTS OF A NATION: HISTORIGRAPHY IN JİN MAGAZINE

İbrahim TARDUŞ*

Öz

Kürt gazeteciliği 1898 yılında *Kurdistan* gazetesiyle başlamış, *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd* gibi yayınlarla devam etmiştir. Dönemin birçok Kürt aydını da bu yayınlarda düşüncelerini yazmıştır. Başlangıçta Kürtlerin geleceğini Osmanlı İmparatorluğu'nun geleceğinden farklı görmeyen Kürt aydınlarının Birinci Dünya Savaşı öncesindeki yazıları ve faaliyetleri dikkate alındığında onlardaki Osmanlılık bilinci açıkça görülür. Fakat birçok Kürt genci ve Kürt aydınının Birinci Dünya Savaşı'na Osmanlı saflarında katılmasıyla gazetecilik faaliyetleri dört yıl süreyle durdurulur. Dört yıl sonra Osmanlı, Mondros Mütarekesi'nden sonra savaştan çekilir. Ancak savaştan sonra hem Osmanlılar hem de Kürtler değişmiştir. Mütareke döneminde Osmanlılık duygusu zayıflamış ve Kürtlük duygusu kendini daha açık bir şekilde göstermeye başlamıştır. Bu dönemde aydınlar, halkın hakkını aramak amacıyla dernekler kurmuş ve yayın faaliyetleri yürütmüşlerdir. *Jîn* yazarları da kendi tarihlerini ve tarihsel köklerini araştırmak amacıyla tarihi metinler kaleme almıştır. Bu çalışmanın amacı *Jîn* Dergisi'nde yazılan tarihi yazıları, tarih yazımı perspektifinden incelemek ve bu yazıların kendilerine has özelliklerini ortaya çıkarmaktır.

Anahtar Kelimeler: Tarih yazımı, milliyetçilik, Osmanlılık, Kürt aydınları, *Jîn* dergisi.

Kurte

Rojnamegeriya Kurdî di 1898an de bi rojnameya *Kurdistanê* dest pê kiribû û bi weşanên *wekî Rojî Kurd* û *Hetawî Kurdê* berdewan kiribû. Gelek rewşenbîrên Kurd ên wê serdemê di van weşanan de fikrên xwe nivîsibûn. Rewşenbîrên Kurd ku di destpêkê de dahatûya Kurdan ji dahatûya Împaratoriya Osmanî cuda nedidîtin, di nav hin rêxistinên wekî Îttîhad Terakkîyê de cih girtin. Bi taybetî dema ku nivîs û çalakîyên rewşenbîrên Kurdan ên berî Şerê Cihanê yê Yekem bê nêrîn, ev hişmendîya Osmanîbûnê bi zelalî tê dîtin. Ji ber ku gelek xort û rewşenbîrên Kurd di artêşa Osmanî de tevî şer bûn, xebatên rojnamegeriyê ji bo çar salan sekinî. Piştî çar salan bi Mutarekaya Mondrosê Osmanî ji şer vekîşiya. Lê piştî şer him dinya him Osmanî him jî Kurd guheribûn. Fikr û hîssiyata rewşenbîrên Kurdan jî guheribû. Di dewra mutarekeyê de, hîssiyata Osmanîbûnê lawaz bibû û hîssiyata Kurdayetiyê zelaltir xwe nîşan dida. Armanca rewşenbîran ew bû ku bi rêya komele û weşanan mafê gelê xwe bigerin. Nivîskarên *Jînê* jî ji bo lêkolîna dîrok û koka xwe ya dîrokî metnên dîrokî nivîsandin. Armanca vê xebatê ew e ku fikriyat û hişmendîya nivîsarên dîrokî ên Kovara *Jînê* lêkole û taybetmendiyên wan ên xweser derxe holê.

* Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı, Mardin, ibrahimtardus1@gmail.com, ORCID: 0000-0002-8292-0921.

Peyvên Sereke: Dîroknûsîn, neteweperwerî, osmanîtî, rewşenbîrên Kurd, kovara Jînê

Abstract

Kurdish journalism began in 1898 with the *Kurdistan* newspaper and continued with publications such as *Rojî Kurd* and *Hetawî Kurd*. Many Kurdish intellectuals wrote their opinions in these publications. Initially, Kurdish intellectuals, who did not see the future of the Kurds as different from the future of the Ottoman Empire, took part in organizations such as the İttihad Terakki, which considered all the peoples living in the Ottoman Empire as Ottomans and fought for the liberation of the Ottoman Empire. Considering the writings and activities of Kurdish intellectuals before the First World War, their Ottoman consciousness is clearly visible. Many Kurdish youth and Kurdish intellectuals joined the Ottoman side in the First World War and their journalistic activities were suspended for four years. Four years later, the Ottomans withdrew from the war after the Armistice of Mondros. However, both the Ottomans and the Kurds changed after the war. During the Armistice period, the sense of Ottomanism weakened and the sense of Kurdishness began to manifest itself more openly. The aim of intellectuals was to seek the rights of the people through associations and publications. *Jîn* writers also wrote historical texts to investigate their own history and historical roots. The aim of this study is to analyze the historical writings in *Jîn* Magazine from the perspective of history writing and to reveal the unique characteristics of these writings.

Keywords: Historiography, nationalism, ottomanism, Kurdish intellectuals, Jîn magazine.

DESTPÊK

Dîrok di înşaya netewe û nasnameya neteweyî de hêmayeke bingehîn bû. Avakarên neteweyan li her derî wekî hev difikiriyên: divê neteweya wan xwedî dîrokekê bûna. Ev dîrok çiqas kevin û mexrûr bûna hewqas baş bû. Avakirina hîşmendiyeke dîrokî a netewî ji bo avakirina hesta netewperweriyê a li ser gel wekî şertên bingehîn dihate dîtin (Berger, 2017, r. 1). Çawa Berger jî îfade dike ev rewş ji bo piraniya pêvajoya avakirina neteweyan derbasdar bû. Pêvajoya avakirina neteweyan ber bi dawiya sedsala 18an bi awayekî sîstematîk dest pê kiribû û di sedsala 19an de gelek geş bûbû. Di sedsala 19an de dewletên mezin ev pêvajo kêr zêde temam kiribûn. Lê piştî şerê Cihanê yê Yekem gelek împêratorî hilweşiyabûn û neteweyên di terîtoryaya împêratoriyan de dijîyan û ne xwedî dewletekî bûn, ji bo dewleta xwe ava bikin an mafê gelê xwe biparêzin ketibûn nav hin hewldanan. Helbet ji bo dewletbûnê netewe pêwîst bû û ji bo vê jî avakirina neteweyê pêwîst bû. Pêwîstiya avakirina neteweyê wekî encamekî xwezayî pêşî di nav rewşên bîran de dinizlî. Rewşên bîrên netewperwer ji bo vê armancê berê xwe dabûn rabirdûyê. Ji ber ku hebûna rabirdûyekê, mafê xwedîbûna dahatûyê jî erê dikir, rewşên bîr divê di pêvajoya avakirina nasnameya netewî de neteweyê bi rabirdûyê gewre û tradîsyonekî birûmet ve girê bida û vê tradîsyonê jî wekî mîtoseke netewî bi civakê re pêwendîdar bikira (Benlisoy & Benlisoy, 2002, r. 246).

Înşakirina nasnameya netewî wekî hêmayeke giring a neteweyê hewceyî bi afirandina çîrokeke hevpar a rabirdûyê hebû. Dîroknûsîna netewî di vê niqte de dikete dewrê, mîtos û sembolan ava dikirin ku neteweperwerî beyî wan nedibû û bi vî awayî avakirina nasnameya netewî de ciheke bingehîn digirt. Vegêrana rabirdûyê ku êdî bûbû perçeyê nasnameya netewî, zarurîyeta veserastkirinê li ser raya tradîsyonel a rabirdûya dîrokî ferz dikir. Ev veserastkirin perçeyeka şoreşa sembolîk bû ku di sîstema sembolîk a civakê de ango di zîhnîyet, nirx, norm û temsîlên zîhnî de guherîn pêk dianîn. Rabirdû, di nav konteksta vegêrana dîroka netewî de jinûve dihat watedarkirin û yekkirin (Benlisoy & Benlisoy, 2002, r. 242). Rewşên bîrên Kurd jî ji bo hişyarkirin avakirina fikra netewetîya Kurdan di dîroknûsîneke nû de gelek bi israr bûn. Bi vî awayî him hebûna Kurdan ê hatiba pênasekirin him jî di navbera Kurdên wê demê û dewra borî de pirek ava bûbûna (Issi, 2021, r. 115).

Hobsbwan peywenda dîroknûsîn û neteweperweriyê wisa rave dike: Çawa ku xaşxaş ji bo eroînê madeya xam be, dîrok ji bo îdeolojîyên neteweperwerî, etnîk û fundamentalîst madeya xam e. Rabirdû, hêmaya bingehîn e di van îdeolojîyan de. Heke rabirdûyê guncav tune be ew bo her gav dikare bê hilberandin (Hobsbwan, 1997, r. 5). Li gorî vê gotina Hobsbwan dikare bê fehmkirin ku rabirdûyê guncav gelek caran hilberandîye. Ji alî hilberandinê ve Smith jî

nêzîkê Hobsbwam difikire lê di nêrînên wî de ferqek heye. Li gorî Smith ji bo ku eşîrên koçber veguhezin netewekî sazûman, ji bo aîdîyetê nasnameyekî bidî wan, wan bikî yek û pevgerêdana wan pêk bînî, hêsta xweserîyê bidî wan, wan bînî halekî wisa ku karibin xwe bi rê ve bibin, hewcetî bi çarçoveyêke sembolîk heye. Bi vî awayî civak tevdigere û îstîkrarê bi dest dixê. Ev jî bi saya mîtolojiya rabirdûyê pêk tê. Bi rêya mîten nijada hevpar, kom û çînen ji hev veqetîyayî digihîjîne hev (Smith, 2002, r. 256). Di vê pêvajoyê de gelek caran mîtosên ku ji alî rewşenbîrên netewperwer ve tên honandin bi temamî ne ji agahiyên çêkirî tên bidestxistin, ew ji harmonîya destan, veqayîname, qeydên demê, motîf û tradîsyonê pêk tên. Ev jî ji xebatên xîretmend ên rewşenbîran dertên holê ku ew ji bo kokên xwe di lêgerînekî de ne (Smith, 2002, r. 228-229).

Dîroknûsîna netewperwerî ku kêma zêde di hemû pevajo ya avakirina netewan de wekî zerûriyetekî xuya bûye di serî de ne wekî sistemeke rêk û pêk xwe dabû der. Ew wekî pêvajoyeke xwezayî derketibû holê. Rewşenbîrên ku dixwestin neteweya hişyar bikin li gelek deverên dinyayê bi awayekî xwezayî xwe di nav lêkolînên rabirdûyê de dîtibûn. Vê pêvajoyê awayê nivîsandina dîrokê guhertibû. Dîroknûsîna klasîk ku zêdetir armanca wê neqlkirina dem û ciyê bûyeran bû diruveke din girtibû. Dîrok êdî ji tespîtan wêdetir bi şîroveyên armancî dihate nivîsîn. Ev armanc jî nîşandana rabirdûya gewre ya di xizmeta avakirina neteweyê bû. Bo nimûne dîroka Kurdan heta sedsala 20an bi awayekî klasîk hatibû nivîsîn. Li gorî lêkolera Cafer Açar taybetiyeke bingehîn a dîroknûsîna Kurdan ew bu ku dîroknûsîna Kurdan dîroka îqfidar-xanedanan dixistine navenda metna xwe û bi awayekî kronolojîk serencamên xanedanan qeyd dikirin û sedem û encamên rûdanan tehlîl nedikirin (Açar, 2018, r. 8). Dîroknûsîna Kurd ên serdema modern jî bi heman armancê berê xwe dabûn rabirdûya xwe û xwestibûn bi saya mîtos, destan û dîrokê neteweya xwe hişyar bikin û nasnameya netewî ava bikin. Êdî ew entelîjîyansiyaya li pey rabirdûyê bûn. (Ji bo têgeha “entelîjîyansiya li pey rabirdûyê” li Smith, 2002an binêrin). Vê helwestê xwe di nav rewşenbîrên Kurd ên sedsala 20. dabû der. Nimûneyên vê hewlê di rojname û kovarên pêşîn en kurdan de bi awayekî zelal dihate dîtin. Rewşenbîrên wê demê ji arîstokratên xwenda û ehlê medreseyê yê berê pêk dihat û bi serdema nû re rewşenbîrên ku li mektebên nû xwendibûn li wan zêde bûn. Armanca wan hişyarkirina gel bû (Alan, 2021, r. 47).

Kovara *Jînê* jî yek ji van weşanan bû ku gelek nivîsên dîrokî têde cih digirtin û bi rêya wan dihate xwestin ku gel hay ji rabirdûya xwe hebe û hişyar be. Hin kêkolera li ser Kovara *Jînê* xebat kirine. Bo nimûne, Bozarlan hemû hejmarên *Jînê* him bi awayê orijînal yanî tîpên Erebi, him bi tîpên Latîni him jî bi Tirkiya îro di pirtûka xwe de civandiye. Li gel van M. Emîn Bozarlan di xebata xwe ya hêja de pêşî nirxandin, şîrove û analîzên xwe yê derbarê *Jînê* de

nivîsîne û bi awayekî giştî li ser mijarên dîrokî yên *Jînê* jî hin agahî dane (Bozarslan, 1985, r. 40-47). Jê pêştir Özcan (2015) ji bo taybetiyên neteweperweriya Kurdan a destpêka sedsala 20. fehm bike wekî nimûne hemû nivîsarên kovara *Jînê* analîz kirine. Lê dema tenê nivîsên dîrokî yên *Jînê* bên lêkolîn gelek kitekitên din dertên holê. Armanca xebata me jî ew e ku em li ser vê babetê lêkolîneke kûr bikin û hûrgiliyan zêft bikin. Ji ber vê jî di vê nivîsê de ê pêşî li ser taybetiyên demê bê sekinin û paşî hûrgiliyên nivîsarên dîrokî bên tehlîlkin.

1. Tevgerên Kurdan di Dewra Meşrutîyeta Duyem de

Piştî îlana Meşrutîyeta Duyem (1908) li Osmanî nîsbeten rewşeke azad pêk hatibû. Stenbol jî him paytexta sîyasî a Osmanî bû him jî paytexta çand û rewşenbîrîyê bû. Gelek rewşenbîrên neteweyên di bin banê Împaratoriya Osmanî de dijîyan û hin rewşenbîrên biyanî jî Stenbolê bo xwe kiribûn sitargeh û xebatên xwe yên sîyasî û çandî li wir dimeşandin. Bi taybetî di sedsala 19an de çî wekî sirgûn, çî wekî rehîneyên sîyasî, çî wekî xwendekar an xebatkar berê Kurdan ketibû Stenbolê. Ber bi serê sedsala 20an ve jî êdî behsa nifşên duyem dihate kirin. Hin Kurd êdî wekî nifşa duyem li Stenbolê ji dayîk bûbûn û li wir mezin bibûn û bi guherina demê û polîtîkayan re li îdareya Osmanî de gihiştibûn meqamên bilind. Dewr, dewra xwehesîn û xwenasînê bû, rewşenbîrên Kurd jî êdî bixwe hesiyabûn û dixwestin xwe nas bikin û gelê xwe jî hişyar bikin. Atmosfera azad a Meşrutîyeta duyem rê dida ku rewşenbîr bi rêya cemîyet, rojname û kovaran bigihîjin hev û fikirên xwe belav bikin. Di rewşeke wisa de di sala 1908an de Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti/Komelaya Hevgirtin û Pêşketina Kurdan ji alî Kurdên li Stenbolê hate avakirin. Serokê komeleyê Seyyîd Abdulqadir bû (Celîl, 2001, r.5 9; Tunaya, 2003, r. 430). Sê xanedanên pêşeng ên Kurdan; Baban, Bedirxanî û Nehrî di vê komeleyê de gihiştine hev, ji bilî wan gelek rewşenbîr û sîyasetmedarên wê çaxê jî di komeleyê de cî girtin (Aykaç, 2022, 147; Celîl, 2001, r. 59). Komele di heman demê de bi navê Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi rojnameyekî derdixist. Ev rojname meha dawîn a 1908an de dest bi weşanê kiriye û neh hejmar derketiye. Ji rojnameyê fehmkirina hest û bawerî û cîhanbîniya rewşenbîrên Kurd ên wê demê mimkun e. Lê piştî Îttîhad Terakkî xwe di rêvebirinê de qewî kir, xwe jî polîtîkaya azadî û wekhevî yê dûr xist û berê xwe da Turancîtî û Tirkîtîyê. Di 1909an de gelek cemiyet hatin girtin, Komeleya Hevgirtin û Pêşketina Kurdan jî ji vê rewşê bêpar nema, di 1909an de rojnameya wan piştî hejmara nehan êdî hew derket û komele jî di 1910an de faalîyetên xwe sekinandin (Celîl, 2001, r. 71).

Di 1912an de ji alî xwendekarên Kurd ve Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti/ Komeleya Hêvî'yê hate avakirin. Ev yekem komeleya xwendekarên Kurd bû. Ji alî vê komê ve sê weşan hatin derxistin. *Rojî Kurd, Hetawî Kurd* û *Yekbûn*. Heta îro hejmarên Yekbûnê nehatine dîtin û lê hejmarên

Rojî Kurd û Hetawî Kurd li ber dest in. Di van weşanên de ji ber guherîna polîtîkayên wê rojê rewşên Kurd zêdetir li ser meseleyên neteweyî sekinîne û girîngî dane ziman, perwerde, dîrok, welat, yekîti û hevgerîtinê (Duman, 2013, r. 23-24). Piştî destpêkirina Şerê Cihanê ya Yekem gelek endamên Komeleya Hêvîyê mecbûr mane ku herin leşkeriyê. Ji ber vê jî faalîyetên komeleyê hatiye sekinandin. Gelek kesên ku tevî şer bûne jiyana xwe ji dest dane (Alan, 2015, r. 23). Kurdiyê Bitlîsî piştî salan xortên Hêvîyê yad dîke û dibêje, ez wan wekî qehremanên xort bibîrtînim ku wan dixwest bi dil û can sazgeheke netewî ava bikin. Lê mixabin Herba Ûmûmî ew ji me standin û li cebheyên cuda cuda belavkirin. Ev çûn û tiştê ji wan dihat mixabin tenê xeberên nexweş bûn. Hê jî dema ez wan bibîrtînim ez dinalim, îftîxarê dikim û digirîm. Bitlîsî paşî bangî wan dîke û dibêje, hêvîya we nemiriye, ew meşaleya hêvîya netewî ku we bi gelek zehmetiyên pêxistibû, îro di destên xortên wek we de ber bi ronahiya dahatûyê ve diçe (Bitlîsî, t.t. 1919, r. 12). Ev hevokên Bitlîsî nîşan dide ku tevgera rewşên Kurd ên berî Şerê Cihanê yê Yekem piştî şer jî domiyaye.

Piştî Şerê Cihanê yê Yekem neteweyên di bin teritoryaya împaratorîyan de dijiyan li pey çarenûsa xwe ketibûn û dixwestin di sîstema nû a dinyayê de an serxwebûna xwe bidest bixin an maf û refaha netewa xwe biparêzin. Vê navbeynê de rewşên Kurd li Stenbolê Kürt Teali Cemiyeti/Komeleya Pêşveçûna Kurdan (1918) ava kir. Axlebî endamên komeleyê fikrên xwe di Kovara *Jînê* û kovara *Kurdistanê* de dinivîsandin.

2. Kovara *Jînê*

Kovara *Jînê* wekî weşanên neresmî yê Kürt Teali Cemiyeti/ Komaleya Pêşketina Kurdan tê hesibandin (Bozarslan, 1985, r. 9). Bi giştî 25 hejmar derketine. Heta jimareya 20an berpirsiyar Hemzayê Mîksî ye, ji hejmara 21an heta 25an jî berpirsiyar Memdûh Selîm Beg e. *Jîn* bi du zaravên Kurdî, Kurmancî û Soranî û bi Tirkiya Osmanî hatiye weşandin. Sûleymaniyelî Tewfîq (Pîremêrd), Kurdîyê Bitlîsî, Kemal Fewzî, Evdirehîm Rehmîyê Hekarî, Memduh Selîm Beg, Yamûlkîzade Azîz û Law Reşîd wekî nivîskarên daîmî yê kovarê ne, ji bilî wan Îhsan Nûrî, Qazîzade Mîstefa Şewqî, Qazîzade Latîf, Kamran Alî Bedirxan, Haydarîzade Îbrahîm, Sûleymaniyelî Wedad, Sûleymaniyelî Nejad û Lahûtî jî car caran di *Jînê* de nivîsîne. Ligel wan di rûpelên *Jînê* de em rastî helbestên klasîk ên helbestvanên mezin ên Kurdan jî tên.

Kovara *Jînê* ber bi dawîya 1918an dest bi weşanê kiriye û ber bi dawîya 1919an jî weşana wê sekiniye. Herçiqas weşanekî demkurt be jî ji aliyê temsîliyeta ve cîyê xwe ya girîng heye. Ev kovar temsîliyeta fikrên rewşên Kurd a dewra mutarekeyê nîşan dide. Ji bo vê dewrê dikare bê gotin ku rewşên Kurdên Osmanî êdî rewşên Kurd in, ew ji nasnameya xwe

ya Osmanîbûnê dûr ketine û tiştên dikin êdî dixwazin bo Kurdîtiya xwe bikin an jî ev dewr destpêka guherînên navborî ne.

Di hejmarê ewil a Jinê de bi navê “Maksadımız” agahdariyeke kin heye, lê bereksê kinbûna xwe armanca *Jinê* têr û tije rave dike. Çawa ku li wir hatiye destnîşankirin, çar armancên sereke yên *Jinê* hene. Derbarê dîrok, mafên netewî, sosyolojî û edebiyata Kurdan de weşanê bike. Sedema van jî ew e ku ev babet ji demên berê ve hatine îhmalkirin. Lê herçiqas li vir rasterast nehatibe gotin jî yên ev babete îhmal kirine, Osmanî ne, ji ber ku di rêzên Kurdîyê Bitlîsî de diyar dibe Kurdan heta wê çaxê xwe wekî Osmanî dîtibû lê Osmanîyan ew îhmal kiribûn (Bitlîsî, 1918a, r. 8). Li gorî Haydarîzade Îbrahîm jî armanca sereke a *Jinê* taqîba muqadderata Kurdan bû (Haydarîzade, 1918, r. 3). Dikare bê gotin ku rewşenbîran dixwest di qedera neteweya xwe de xwedî gotin bin û karibin hin tiştan bikin.

3. Dîroknûsê *Jinê* Kurdîyê Bitlîsî

Dema bi hûrgilî li nivîsarên dîrokî bê nêrîn, tê dîtin ku kesê herî berhemdar û bi awayekî sistematîk berê xwe daye mijarê Kurdîyê Bitlîsî ye. Dikare bê gotin ku Bitlîsî xwedî hişmendiyeke dîrokî a xurt e. Ji bo hişmendiya dîrokî li nifşên nû a neteweyê jî hasil bibe ew wekî manîfestoyekî fikrên xwe rave dike. Ew dibêje, jixwe firsendên îro ji destê me çûn, êdî berpirsiyariya me ew e ku em neteweya xwe ji êş û mirinên dahatûyê biparêzin. Ji bo vê jî helbet rêxistineke modern lazim e. Ev rêxistin jî dikare li ser binyada rabirdûya netewî bilind bibe (Bitlîsî, 1919a, r. 3). Bitlîsî ji bo dahatûyê serkeftî, rabirdûyê ronîkirî pêwîst dibîne. Ji bo wî dîrok ew hêz e ku neteweyê ji bo dahatûyê amade dike. Gotinên wî yên manîfestîk ên di vê mijarê de ev in:

Rabirdû xezîneyeke qewetê ye, gelên ku ji wir feyzên jînê ji bo damarên netewî neherikînin, di têkoşînên xwe yên netewî de gelek zû diwestin. Tiştê ku ê di têkoşîna wan de para wan bikeve zincîrên hêsîrîye ye. Wey li wê civakê ku meyla dûrketinê ji rabirdûya xwe dike!

Kiryarên bavûkalan, di vegotin û avakirina tevgerên ûlvî de ji hêmayên îro zêdetir bandordar û pêçebare in. Rabirdû dîrok e; her rêza ku dîroka netewî li ber çavên neviyan radixe, pireke kelecane û şewqê ye ku ji bo dahatûya neteweyê hatiye avêtin. Heke nevi berê xwe nedine wan pesn û tevgerên bavûkalên xwe yên ku perên dîrokê dadigirin, ew ê di rêya jiyane de mehkûme wê çala tunebinê bibin ku zemanê ji bo wan amade kiriye.

Ji ber vê jî, hewcetî bi vê heye ku em neteweya xwe ya ku bi felaketan şewişî ye ji singa wî bigirin û bihejin, çavên wî yên ku ji xayîsîyê mexmûr bûne, bidine ber bi dûrahiyan û di guhên neteweya xwe de bi dengê bilind şaş û mezinahiya bavûkalan bang bikin (Bitlîsî, 1919a, r. 3-4).

Nivîsarên dîrokî yên kovara *Jinê* bi taybetî jî yên Kurdîyê Bitlîsî di serî de wekî bersiv an bertekekî bûn, ji ber ku pirtûkeke bi navê *Kürdler* di serê 1918an de ji alî Osmanlı Muhacirin Müdüriyet-i Umumisi ve hatibû weşandin û di pirtûkê de gelek agahiyên şaş hebûn. Qaşo ev ji

alî zanayekî navdar ê Alman ve ji alî Doktor Frîç ve hatibû nivîsîn. Lê di rastiya xwe de ne wisa bû ji alî kesekî peywirdarê îstîxbarî ê Osmanî ve hatibû nivîsîn navê wî jî Habîl Adem bû (Aydın, 2014, r. 8). Îro herçiqas ev rastî bê zanîn jî ew roj nedihate zanîn û rewşenbîrên Kurdan xwe mecbûr hîs dikirin ku bersiva vê pirtûkê bidin. Kurdîyê Bitlîsî jî efsaneyên dîrokî ango mîtolojiyê bi kar tîne û dîxwaze bersiva wan kesan bide ku dibêjin Kurd tunene (Pertev, 2018, r. 200). Nivîsara ewilîn a Kurdîyê Bitlîsî bi vê sernavê ye: “Muhacirin Müdiriyeti Yayınlarından Kürdler Münasebetiyle Zehak Efsanesi” (Bitlîsî, 1918a). Ne belesebeb e ku Bitlîsî nivîsara xwe ya yekem de behsa Efsaneya Dehaq dike. Efsaneya Dehaq ji bo Kurdan efsaneya koka Kurdan e. Ji ber ku Frîç di pirtûka xwe de iddîa kiribû ku destpêkek an orjîneke Kurdan tune, dewreke wan a tarîxî tune, ew ne xwedî çandekî ne ji ber vê jî adetên wan nehatine qeydkirin. Zimanê wan Arî ye, lê ev nayê wê wateyê ku ew Arî ne. Zimanê wan şaxekî Farisî ye. Li gor wî di dema Asûrîyan de li Kurdistana îro hikûmeteke Turanî a bi navê Lordhu hebû û ji begên wan re Kirt dihate gotin ku di wateya 'bey'ê de ye. Dema eşîrên Kurdan hatine vê derê û wargeha wan dagir kirin an jî peywîrên muhim girtin ji ber vî wan navê Kurd stand. Hatina Kurdan jî bi du ihtîmalan ve girê dida: a yekî Dehak, tê Medya, Sûmer, Hîtî û Asur û Lordhuyê îstîla dike, û ji Îrana xerbî xelkek ligel xwe tîne, ev xelk li derdorê belav dibin. A didoyan, dema Asûr hildiweşe koçên gelan dest pê dike û hin eşîrên melez tînan van deran (Frîç, 2014, r. 3-10). Piştî van agahiyan jî wergereke xirab û tehrîfkirî ya Şerefnameyê dikir. Yanî herçiqas wekî pirtûkek hatibe naskirin jî tenê nivîseke kin a li ser nebûna Kurdan û Kurdî pêk dihat ku ji alî ilmî ve qiymetî herbîyeyeke wê tune, ew berhemeke zirzanistane ye. Pirtûk çawa me gotî jî nivîsek û wergereke xirab û tehrîfkirî ya Şerefnameyê pêk tê, Kurdîyê Bitlîsî jî nivîsa xwe de diyar dike ku, pêşî di kovara Îçtîmaiyyatê de ji alî M. Zekerîya Bey wek kurteyî hatiye nivîsîn û paşî navê xwe li pirtûkê kiriye (Bitlîsî, 1918a, r. 8).

Bitlîsî li hember fikrên Dr. Frîç xwestiye him hebûn him jî koka Kurdan nîşan bide. Mîtosên ku li vê mijarê jî digunçe helbet Efsaneya Dehaq bû. Bitlîsî piştî vegêrana efsaneyê gihîştibû sê encaman: Kurd qewmekî Îranî ne û ne Fars in, Kurd di dema Dehaq de ber bi Rojava ve hilkişiyane paşî li Bakur belav bûne û deştî ne, dawîlêanîna zilma Dehaq her sal 31ê Tebaxê ji alî Kurdan ve tê pîrozkirin ji ber vê yê ku dawî li zilma Dehaq anîna Kurd in (Bitlîsî, 1918a, r. 9-10).

Çawa ku Abbas Valî nivîsîye îdeolojiya netewperweriyê ji bo karakterên dîrokî a rabêja netewî û meşrutiyeta doza netewî bi awayekî vekirî dîrokê bi kar tîne, ev jî nîşan dide ku îdeolojiya netewperweriyê hewcetî bi kokekî heye. (Valî, 2005, r. 9) Dema mirov li gorî vê tesbîtê berê xwe bide meseleya zirpirtûka Dr. Frîç tê dîtin ku wî bi her awayê hewl daye ku nebûna koka

kurdan îspat bike û rewşenbîrên Kurd jî her hewl dane ku hebûn û koka Kurdan û Kurdî tesbît bikin. Çawa Bozarslan diyar dike dîroknûsîna her demî berhema dema xwe ye, pirsên ku ji dîrokê tîn kirin yên îro ne û her yek ji wan li gor aktor û nêzikatiyên îro teşe digirin (Bozarslan, 2005, r. 42). Diyar dibe ku pirsên dîroknûsînê ya dewra mutarekeyê ji bo Kurdan ev bûn: Em kî ne û ji ku hatin? Çawa Bozarslan li ceyeke din jî dinivîse, dîroknûsîna rewşenbîrên Kurd jî ne tenê ji bo dîroknûsînê ye, ew ji bo îro û dahatûyê watedar bikin, rabirdûyê bibîrdixin (Bozarslan, 2005, r. 35). Dema ji vî alî ve li meseleyê bê nêrîn rast e, dîroknûsînê Kurd ji bo watedarkirina roja xwe û dahatûyê nivîsîbûn lê watedarkirin meseleyeke hebûnê bû û li hember înkarekî dihate nivîsîn. Dema mirov li nivîsarên *Jinê* binêre ev helwest bi zelalî tê dîtin.

Heke em vegerine nivîsaran dibînin ku Bitlîsî di nivîsara xwe ya duyem û sêyem de jî li ser meseleya kokê sekiniye. Bitlîsî berî dest bi Efsaneyê Dehaq bike, ji bo şaşî û xirabî û bediya pirtûka mezkûr destnîşan bike raya xwe wîsa rave dike: Xebatên derheqê Kurd, Kurdî û Kurdistanê de him kêma in him jî şaş in û hin ji wan jî ji rastiye gelek dûr in. Du sedemên sereke yên vê rewşê hene. Yek coğrafyaya Kurdan e ku ev coğrafya him asê ye û him jî Kurdan destûr nedaye ku biyanî bikevinê. Lêkolerên bîyanî nikaribûn xwe bigihîjin axa Kurdan. Gava hal wîsa bû, lêkoleran agahiyên xwe an ji Kurdên bajarî ku li bajaran Tirkîze an Erebiye bûbûn an jî ji Ermenan bi dest xistibûn ku ev agahî ji rastiye dûr bûn û ser de jî lêkolêran Kurdî jî nizanibû. Sedema duyem jî ew bû ku Osmanî girîngî nedaye Kurd û Kurdistanê û ew îhmal kirine, lêkolerên Osmanî jî li ser Kurdan lêkolîn nekirine. Ji ber van her du sedeman agahiyên liberdest bi temamî ne rast in. Dû re gotiye ku Almanan ji lêkolerên Îngîlîz û Rûs dane berhev kirine ku agahiyên wan jî kêma û şaş in û wekî pirtûk weşandine (Bitlîsî, 1918a, r. 7-8).

Ew ên ku nasnameya wan ne hatine lêpîrsîn, mişextîyê nejiyabin, çand û axa wan di bin zextê de nemabin hewcetî pê nabînin ku ji bo avakirina nasnameyekî li kokên xwe bigerin. Ew tenê bi awayekî pozbilind dibêjin em aîdê virê ne, nasnameyeke me ya cuda heye, em nasnameya xwe bi bavûkalên xwe û dîroka xwe zanin (Smith, 2002, r. 22). Heke em li gor van gotinan binirxînin nasnameya Kurdan, kîbûna Kurdan her hatiye lêpîrsîn, dîroka wan bi gelek bûyerên mişextîbûnê ve tijî ye ax û çanda wan jî tîra xwe di bin zextan de maye. Yanî Kurd gelek muhtac bûn ku ji bo avakirina nasnameyekî li kokên xwe bigerin. Bitlîsî di nivîsara duyem de bi vê helwestê li hember angaşên înkare ên pirtûka navborî bi awayekî sistematîk fikrên xwe nîşan dane û fikrên Dr. Frîç pûç derxistine. Di vê mijarê de jî li ser zanistên civakî sekiniye û gotiye encamên zanistên civakî hê di demên xwe yên ewilîn de ne û encamên van zanistan bi temamî jî ne rast in, ji bo nîşandana hebûna netewekî ji wan zêdetir, lazim e mirov li halê hazir binêre, çimkî ji îro şûn de ne netewek dikare bê helandin ne jî dikare bê îmhakirin (Bitlîsî,

1918b, r. 3-4). Bitlîsî nivîsa xwe ya hejmara sêyem rasterast li hemberî pirtûka *Kürdler* û nivîsa di kovara *Îctîmaîyatê* de derketî de dinivîse ku di van her duyan de jî tehrîfkirina Dîroka Netewî a Kurdan Şerefnameyê heye. Dr. Frîç li gor xwe ji bo nebûna koka Kurdan destnîşan bike, qaşo ji Şerefnameyê sûd wergirtibû, Bitlîsî jî şaşiyên wan nîşan dide û angaş dîke ku tiştê wan gotî di Şerefnameyê de nabihorin û ew amade ne heger îddayê xwe îsbat bikin, dikarin fikra xwe jî biguherin (Bitlîsî, 1918c, r. 4). Heman çavkanî û şîroveyên cuda tesbîta Carr tîne bîra mirov. Çawa ku Carr dibêje, dîrok komeka diyardeyên rastkirî ye. Wekî masîyên di nav tableya masîvanekî de, belge, nivîs û diyarde tê de amade ne. Dîroknûs radihije wan dibe malê, dipijîne û dilê wî çawa bixwaze wisa dêtîne ser sifrê (Carr, 2016, r. 60). Ya Dr. Frîç jî kirî tam ev e, dilê wî çawa xwestibe wisa tehrîf kiriye û pêşkeş kiriye. Şerefnameya ku hebûn û dîroka Kurdan piştrast dîke, ji alî Dr. Frîç ve wekî îsbata nebûna Kurdan hatiye pêşkeşkirin.

Hejmara çarem a Jinê de mijar didome lê vê carê nivîs bi awayekî nameyî ji alî Sûleymaniyelî Tewfîq ve tê nivîsîn. Sûleymaniyelî Tewfîq ango Pîremêrd ji berê ve di rojname û kovarên Kurdan de dinivîsand û keseke çalak bû. Bo nimûne ew him nivîskar him jî midûrê *Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesiyê* bû (Aykaç, 2022, r. 151). Destpêka nameya wî ya ji *Jinê* re şandî hinek nefehmbar e, çîmkî baş nayê fehmkirin ku Sûleymaniyelî Tewfîq gelo Kurdîyê Bitlîsî nas nake, an jî haya wî jê tune ku Bitlîsî ji bo êrîşên kê bersiv dinivîsîne di nivîsên xwe de. Nivîsa Tewfîq wekî tevkariyekî ye bo mijarê û Kurdîyê Bitlîsî, ji aliyekî ve bêyî gotin dixwaze Kurdîyê Bitlîsî jî ji hin aliyan ve haydar bike û bo wî reyeke din nîşan bide. Çawa li jorê jî hatibû nivîsin, di mijara kêmbûna çavkaniyan de Bitlîsî destnîşan kiribû ku xebatên derbarê Kurdan de tenê ji alî Evropiyan ve hatine kirin, lê Tewfîq di nivîsa xwe de bi nimûneyan behsa gelek berhemên nivîskarên Ereb û Fars dîke û dixwaze berê Bitlîsî bide bergeheke din jî. Wekî rêbaz jî pêşniyaz dîke ku hebûna Kurd û Kurdistanê bi du awayan bîn isbatkirin. Pêşî bi alikariya zanista dîrokê û berhemên gelek nivîskarên rojhilatî, koka Kurdan bê nîşandayîn û wek gava duyem jî mewcûdîyeta halê hazir a Kurdan a coxrafyayeke belav, bê nîşandayîn (Tewfîq, 1918a, r. 1-3).

Tewfîq berdewama nivîsara xwe di hejmara heftan de dinivîse. Giranîya vê nivîsê li ser du xalan e. Yek kok û dîroka kevnare ya Kurdan û ya duyem jî dîroka nêzîk ku hê jî çîrok, destan û efsaneyan de xwe nîşan didin, bi gotineke din Mîrektiya Baban e. Tewfîq herçiqas destpêka nivîsa xwe bi agahiyên zanista dîrokê dabe dest pê kirin jî paşî raya xwe ya koka Kurdan li ser nêrîneke nezanistî diyar kiriye. Li gor veguhaztina wî li gor zanyaran Kurd ji milê Kardoxên Arî hatine û ew Arî ne. Ew herçiqas rastbûna vê qebûl bike jî, xwe spartîye helbesteke Hecî Qadirê Koyî ku Kurdan wek neviyên Hz. Nûh dibîne û gotiye ev êdî nêzîkê aqilan e (Tewfîq, 1919, r. 2). Bi vê awayê dikare bê gotin ku Tewfîq di dîtina kokeke ji bo Kurdan de ji Bitlîsî

wêdetir çûye. Lê li hember vê jî gotiye ku çî ji Medan, çî ji Kardoxan, çî ji Behram an jî çî ji Nûh bin, wî qewmî ji Eyyûbiyan heta serdemên dawîn gelek hikûmet ava kirine. Bi vê gotinê diyar e ku ew dixwaze ji serdemên gelek dûr ên Kurdan zêdetir girîngî bide serdemên nêzîk. Heta wî bixwe jî diyar kiriye ku halê hazir di qismê weşanê ya cemîyetê de haziriya pirtûkekî tê kirin ku li ser mîrektiya Bitlîsê, Hekarîyê û Botanê ye (Tewfiq, 1919, r. 2).

Bitlîsî bi serenava “Kürdistanaki Kent Sakinleri Türk Müdür?”/“Gelo Niştecihên Bajarî yên Kurdistanê Tirk in?” bi mijareke cuda di sitûnên *Jinê* de cî digire. Ji naveroka nivîsê em têdigihjin ku Bitlîsî bi qasî deh salan li Bidlîsê maye û li gor çavdêrî û lêkolînên xwe gihiştiye encaman. Li gor wî encamên ku wî ji bo Bidlîsê bi dest xistiye ji bo hemû bajarên Kurdistanê derbasdar in (Bitlîsî, 1918d, r. 9). Di vê nivîsarê de tişteke balkêş heye ku Bitlîsî di serê nivîsa xwe de behs dike. Li gor Bitlîsî Kurd û Tirk çar sed salan ligel hev yekitiya qedere par ve kirine, Kurdan her û daîm alikariya Tirkan kiriye, lê îro kesên di rêveberiya Tirkan de vê yekitiyê û dilsoziyê nabînin Kurdan înkâr dikin bi polîtîkayên cuda zerarê didin wan. Bitlîsî vê rewşê rexne dike û dibêje, xetereya ku li ber çav e ji bo Kurd û Tirkan e, Kurd û Tirk xwedî qedereke hevpar in. Dewreke wisa li pêşiya wan e ku divê Kurd û Tirk bi hev re li hemberî bisekinin. Lê di demên dawî de biratiya van her du gelan êdî nayê teqdîrkin. Mijareke din a ku Bitlîsî li ser disekine, Neturanîbûna Kurdan e. Ji bo vê meseleyê rave bike diyar e berê xwe daye gelek çavkaniyên Misilmanan ku berê Suleymaniyelî Tewfiq bo fêmkirina meseleyê ev çavkanî bo wî, pêşniyaz kiribûn û gihiştiye encamekî wisa ku Tirk encax piştî qelsbûna Îranê û pêşketina Îslamê hatine Kurdistanê, berî wê demê minasebeteke wan tune bû ji ber vê jî ne mimkun e ku Kurd Turanî bin. Bitlîsî dûre derbasî analizên xwe dibê ku bi kurtasî wisa dikare bê gotin. Hatina Tirkan a Kurdistanê Piştî Îslamîyetê ye, berî wan jixwe Kurd li vê niştecih bûn, îro axaftina Tirkî a bajaran nîşan nade ku ew Tirk in, ev ji bo Bidlîsê jî ji bo bajarên din ên Kurdistanê jî wisa ye (Bitlîsî, 1918d, r. 4-9).

Bitlîsî di navbera hejmeta 18-21an de rêzenivisarek bi navê “Kürdler İranî Değil Midir?” diweşîne. Ev xebata wî ji gelek aliyan ve balkêş û girîng e, ji aliyekî ve jî wekî manîfestoyekî ye ku em dê hûrgilîyan binivîsin. Bitlîsî ji Kovara *Jinê* gazindan dike, ew dibêje, ji roja pêşîn ve min ji lêkoler û xwedîpênûsan rica kir ku ew bi rêxistinên modern heqên dîrokî û menfaatên sîyasî bînin parastin û ji aliyên din ve jî bi rêya weşanan rayên şaş ên mukadderên dinyayê yên derheqê me de bînin rastkirin. Roj û meh wek brûskan borîn, lê di vê pêvajoyê de mixabin me tişteke nedît û nebihîst ku mafên gelê me bi çalakiyekî biparêze û bi weşanekî Kurdan di çavên biyaniyan de rast nîşan bide (Bitlîsî, 1919a, r. 2).

Gazindeke din a Bitlîsî heye ku diyar e, ew gelek hêrs bûye û li hember vê rêzenivisara xwe ya ku tê de îdda dike Kurd Îranî ne, nivîsîye. Gazind û îtiraza Bitlîsî li Seyyîd Arîf Bey e ku wî di hejmarê çarem a Kovara *Kurdistanê* de nivîsîye ku Kurd ji kurê Hz. Nuh, ji Sam tèn (Bitlîsî, 1919a, r. 4-5). Ev jî tê wateyê ku Kurd ne Îranî ne. Jixwe tiştê Bitlîsî esasen hêrs dike ev e. Bitlîsî bi awayekî zanistî xwe digihîne vê encamê ku Kurd Îranî ne û nivîsa xwe li ser vê dihene. Lê çavkaniyên wî û xwendinên wî zêdetir çavkaniyên rojava ne, ew zêde berê xwe nade çavkaniyên şerqî yên ku Kurdan wekî Ereb dihesibîn. Jixwe li gor Bitlîsî gelek jêgirtinên ji çavkaniyên şerqî, ne layiq in ku mirov wan wekî palpişt nîşan bide. (Bitlîsî, 1919a, r. 4) Diyar e Bitlîsî ji bo vê gelek lêkolîn kirine û derbarê zanista dîrokê de jî xwendinan kiriyê. Herweha diyar dibe ku ew baweriya xwe bi zanistê tîne û dibêje êdî li ber ronîya zanistê hin rastiyên berê êdî ne rast in. Hin meseleyên di Tewratê de derbas dibin û çîroka zarokên Nuh êdî ji sahneya zanistê vedikişin (Bitlîsî, 1919a, r. 5).

Bitlîsî Îranîbûna Kurdan, ango koka Kurdan ji ser sê xalan rave dike: efsaneyên netewî, ziman û rewşa civakî. Li gorî Bitlîsî, di jiyana neteweyekî de berî çendsed sal berê hin qewimînên civakî pêk hatine, ew vegêran bi awayekî şifahî nifş bi nifş hatine û her carê hinek guherîne, heke mirov berê xwe bide van efsaneyan tê de hin bermayîyên dîrokî tèn tesbîtkirin. Bitlîsî nivîsên xwe yên berê ku di *Jinê* de weşandibû refere dike û dibêje min jixwe di wan de behsa efsaneyên Kurdan kiribû û li gor efsaneyan Îranîbûna Kurdan nîşan dabû. Û piştê derbasî meseleya ziman dibe. Di mijara ziman de dibêje yên ku dibêjin di diyarkirina kokê de ziman ne rêbazeke rast e, şaş in (Bitlîsî, 1919a, r. 7). Herçiqas li vir nav nedabe jî qesta wî pirtûka *Kürdler* e. Bitlîsî dibêje herçiqas ji ber rastîhevhatinan û mayîna qewmên din ê li Kurdistanê di Kurdî de gelek peyvên biyanî hene, lê binyada peyv û binyada hevokên Kurdî neguherîne, ango Kurdî binyada xwe parastîye. Heke kesê perwerdeya seratayî jî dîtî, berê xwe bide Kurdî ê bibîne ku kakilê ziman ango rêzimana ku binyada peyv û hevokan ava dike Îranî ye. Gava tiştêk wisa hebe nemimkun e ku bê gotin Kurd Samî an Turanî ne. Di xala sêyem ango xala rewşa civakî de Bitlîsî destnîşan dike ku ev xal xala herî sist e di tesbîtkirina koka netewekî de, ji ber ku neteweyên cuda cuda, dema rastî hev dibin û ligel hev dijîn ji hev hin adetên xwe digirin û bi demê re dişibin hev, lê dîsa jî hin rêç hene ku mirov dikare jê hin tiştan diyar bike. Ew di vê xalê jî xisûsiyetên hevpar zêdetir yên cuda disekine. Ji ber vê jî ber cudahiyan adetan Kurdan ji Turanî û Samîyan dîr û nêzîkê Îranîyan dibîne (Bitlîsî, 1919b, r. 5-6). Lê dikare bê gotin ku vê xalê de îddaya xwe bi awayekî qewî piştrast nake. Ji bo Bitlîsî meseleya Îranîbûna Kurdan meseleya kokê ye, yanî Kurd ji kokeke Îranî tèn. Ew piştî nîşandana vê pirs dike ka gelo dîroka Kurdan heye an na? Perspektîfa wî ew e ku dîroka Îraniyan di heman demê de

dîroka Kurdan e jî. Paşî ji Löö Narman, Maspero û Léon Cahun ku derheqê gelên rojhilatî de nivîsîne, ji xwe re dike palpişt û dîroka Îraniyan dinivîse, nivîsa xwe bi sê encaman xilas dike:

A. Kurd neteweyeke Îranî ne.

B. Koka Kurdan, ji koka wê civakê pêk tê ku bi navê Îran tên nasîn.

C. Dîroka Kurdan bêyî cudahî ji dîroka girseya mezin a Îranê pêk tê (Bitlîsî, 1919c, r. 11).

4. Nivîsarên Derbarê Mîrekiya Baban de

Yamûlkîzade Azîz axlebî ji bilî nivîsarekî hemû nivîsarên xwe derbarê Mîrekiya Baban de nivîsandiye. Di nivîsa xwe ya bi navê, “Kürt Ne idi, Neler İster”ê de eslê Kurdan digihîne Medîyan û destnîşan dike ku Kurd xwedî gelek nirxên mirovayetiye bûn û li coxrafyayeke fireh de cih girtibûn. Ji ber ku axa wan li bakûrê Îranê bû, ew der bû qada gelek şeran û Kurd hêdî hêdî ji qeweta xwe ketin û ketine rewşeke zehmet. Ji ber cudahiyan Sunnîti û Şîitîye û perçebûna di navbera Osmanî û Îranî de ji pêşveçûyinan bêpar man. Lê dîsa jî wan neteweya xwe, hêstên xwe yên paqij û qeweta fikrên xwe taybetiyên xwe yên baş parastin (Yamûlkîzade, 1918, r. 2-3). Mirov bi hûrgilî berê xwe bidê tê ditin ku li ber nivîsên Bitlîsî û Tewfîq nivîsa Yamûlkîzade hinek qels û hamasî mane.

Rêzenivîsarên Mîrekiya Baban di hejmarê 9., 11., 13., 15. û 18. de cî digirin. Diyar e, yek ji motîvasiyona Yamûlkîzade ew e ku bersiva pirtûka *Kürdlerê* bide. Di rêzenivîsa yekem de Yamûlkîzade pirtûkê gelek rexne dike ji ber ku di pirtûkê de derbarê navê Babanan de agahiyeke çewt hatiye dayîn. Peyva Baban ji peyva bebeyê dariştine û ji ber vê jî ew wekî Tirk hesibandine û gotine li gor gelek pirtûkên Tirkîti û Tûrancitîye dikare bê gotin ku malbata Babanan Tirk in. (Yamûlkîzade, 1919a, r. 2) Yamûlkîzade vê rewşê wekî xerabetekî dibîne û paşî derbasê dîrokçeya Mîrekiya Babanan dibe û derheqê Mîrekiya Baban de hin agahiyên ansîklopedîk dide, diyar e piraniya nivîsên xwe ji çavkaniyan sûdwergirtîye lê ev çavkanî kîjan e rasterast diyar nekiriye, tenê li ciyekî, pirtûka bi navê *Rewzet’ul-Sefayê* wekî çavkanî nîşan daye (Yamûlkîzade, 1919b, 3, r. 8).

Emîn Feyzî bi du nivîsên xwe tevkariya Yamûlkîzade kiriye. Terza Yamûlkîzade zêdetir li ser neqilkirina agahiyên bû, lê Emîn Feyzî her çiqas kêr nivîsî be jî ji ber ku mijara nivîsê ji qada pisporiya xwe hîlbijartîbû, mohra xwe li mijarê dabû. Çawa tê zanîn Emîn Feyzî serbazeke teqawitbûyî ye û bi salan li Bexdayê li mektebên leşkeriyê de ders daye û di heman demê de ji Silêmanî ye (Kürdoloji Çalışmaları Grubu, 2022, r. 9). Wate him Mîrekiya Baban him jî leşkeriyê baş zane. Emîn Feyzî di nivîsa xwe ya yekem de li ser qabiliyeta şerî a Babanan disekine. Gelek pesnê qabiliyeta şerî a Babanan vedibêje û lê zêde dike ku ev şîyan ji bo xizmeta

Osmaniyan bi canfîdayî dihate kirin. Feyzî ligel van agahiyan gazindên xwe jî dike. Ew Kurdên Baban ku bi awayekî dilsoz xizmeta Osmanî û Xelifetiyê dikirin, wekî xelat çî standin, hîç (Feyzî, 1919a, r. 6). Paşî ev hikumet ji holê hate rakirin û întîzama ku li heremê pêk hatibû sist bû û derdor kete rewşeke xirab. (Feyzî, 1919a, r. 7) Emîn Feyzî di nivîsa xwe ya duyem de behsa qebiliyêtên ilmî û sinaî ya Kurdên Baban dike. Ligor Feyzî vediguhêze, Silêmanî bajareke sinaî ya çekan bû, top û tivingên gelek biqalîte li Silêmanî dihatin hilberandin. Di ruşdiyeya Bexdayê de gelek xwendekarên ji Silêmanî hebûn, paşî li Silêmanî ruşdiyeyek jî hatibû vekirin û ji wê ruşdiyeyê gelek serbaz û amirên jêhatî derçûn. Ji bilî van li her gundê li derdora Silêmanî şêx an alimekî zana hebû ku Mewlana Xalid ji qîsmeke perwerdeya xwe li van gundan dîtibû (Feyzî, 1919b, r. 12).

5. Nivîsarên Din ên Derbarê Dîroka Kurdan de

Em rastî hin kesan tên ku ne berdeyamî lê carek an du car derbarê dîroka Kurdan de nivîsîne. Süleymaniyelî Wedad yek ji wan e û bi du nivîsaran tevkariya dîroka Kurdan kiriye. Nivîsara wî ya bi serenava “Kürt-Türk Birliğı”/“Yekitiya Kurd û Tirkan” balkêş e. Wedad behsa têkiliya Celaleddîn Harzemşah û Mîrê Bîdlîsê Melîk Eşref dike: Gava Celaleddîn Harzemşah ji alî Moxolan ve tê têkbirin, xwe dispêre mîrê Bidlîsê, mîr wî û artêşa wî diparêze. Dawiyê de Melîk Eşref keça xwe dide Celaleddîn ango Celaleddîn dibe zavê Kurdan. Li gor Wedad yekitiya Kurd û Tirkan hê wê çaxê hatiye avêtin û dewra Sultan Selîm de jî bi awayekî hêsan ev gîredan xurt bûye (Wedad, 1919a, r. 2-3). Nivîseke din ya Süleymaniyelî Wedad bi serenavê “Kürdçe Dilimiz” heye. Vê carê navê wî Genç Kürdlerden İsmail Wedad e. “Genç Kürd” bi qesd hatiye hîlbijartin ji ber ku dema wî behsa Xelîl Xeyalî û babê xwe û nifşa nû kiriye nifşa nû a Kurdan wekî Jön Kürd binav kiriye (Wedad, 1919b, r. 10). Tişte ku vê nivîsê dike mijara xebata me ew e ku Wedad ne li ser taybetiyên rêzimanî an fonolojîk sekiniye ew li ser dîroka ziman sekiniye. Ew dibêje min gelek lêkolîn kirine û ez gihiştîme hin encaman, lê çavkaniyên wî ne diyar in. Ji bo dîrok û çavkaniya Kurdî gihiştîye van encaman ku Kurdî berî dîrokê ve heye, zimaneke Arî ye û cewîyê Hîndî û Farisî ye. Kurdî ji Farisî kevintir e, ji ber ku Farisî ji Pehlewî zaye, lê Kurdî mamê Pehlewî ye. Çawa li jor jî hatibûn destnîşankirin, çavkaniyên wî ne diyar in. Lê wî destnîşan kiriye ku di xebatên dahatûye de ê angaşên xwe bi nimûneyan îsbat bike (Wedad, 1919b, r. 11). Bitlîsî gava di behsa ziman de pêşniyazên xwe rêz kiriye, nivîsa Wedad îşaret kiriye û xwestiye piştî vê nivîsê gelek rayên cuda bèn û kêşeyên di nivîsê de destnîşankirî bèn nîqaşkirin û lêkolîn (Bitlîsî, t.t. 1919, r. 10).

Yek ji nivîskarên *Jinê* ku derheqê dîroka Kurdan de nivîsîye Kamran Alî Bedirxan e. Tiştê Bedirxan motîve kiriye, prensibên Wilson in ku di heman demê de Bedirxan di nivîsa xwe de

pesnê wî jî daye. Bedirxan ji bo meseleyeke aktuel a wê rojê nivîsîye ku di navbera Kurd û Ermenan de li serî niqaş hebûn. Mesele, meseleya axê bû ka li Wan, Elazîz, Diyarbekir, Bidlîs, Erziromê piraniya nifûsê ji kê pêk dihat. Bedirxan ji zanyaran û ji dîroknûsan gelek palpiştan destnîşan dîke ku nifûsa Kurdan li bajarên navborî zêdetir in, û Ermen li qet ciyê van bajarên ne xwedî piraniyê ne. Ev berî Hevpeymanîya Berlînê jî wisa bû piştî wê jî wisa (Bedirxan, 1919, r. 6-9).

Şilanlîzade Yusuf Sabrî jî yek ji wan kesan e ku di *Jinê* de derheqê dîroka Kurdan de nivîsîye. Yusuf Sabrî bi gotinên hamasî û pesnî dest bi gotinên xwe kiriye û ji çavkaniyên biyanî sûdwegirtiye. Çavkaniyên ku wî jê sûdwegirtine ev in, Wergera Fransîzî ya Şerefnameyê ango *Fastes de la Nation Kourde*, Au Kurdistan Henry Binder, ya din jî Dr. Spitker û Emile Hamlin in. Yusuf Sabrî, agahiyên ji çavkaniyan standî vediguhezîne xwîneran û bi vî awayî dixwaze dîrokîbûna Kurdan îsbat bike (Şilanlîzade, 1919a, r. 3-5). Ligel vê jî paragrafên ku wateya navê Kurdan û lehengên wan û pesnên wan dihevwîne bi rêya wergerê derbasî nivîsa xwe dîke û dixwaze şanazî û mexrûrîyê netewî pêk bîne (Şilanlîzade, 1919b, r. 9-10). Diyar e ku Yusuf Sabrî keseke baş perwerdedîtî ye, ew him bi Almanî him jî bi Fransîzî dizane û xwe digihîne wan çavkaniyan.

Meseleya rojên netewî û tesbîtkirina wan rojan ji bo nivîskarên Jinê wekî armancekî dertê pêşberî me. Ji ber ku di rêya netewebûnê û netewemabûnê de rojên netewî her nifşa nû careke din bi dîrokê ve girê dide û dibe wesîle ku nifşa nû bi kişîfîkirina dîroka xwe coşa netewî hîs bike. Memduh Selîm, derbarê diyarkirina rojên taybet ên netewî de behsa girîngiya bîranîna wan rojan dîke, bi gotinên wî ew rojên taybet ên netewî tesbît nake, tenê divêtiya wan rojan dixwaze nîşan bide. Ji ber ku rojên netewî her çiqas heqê neteweyan be hewqas jî berpirsiyarîya wan e. Ev roj kurteyên dîrokê ne, di van rojan de dîrok dîsa tê jiyîn û ji dîroka ku bê jiyîn xeber tê standin. Ew tesbîtkirina rojên netewî jî li xortan û dîroknasan bar dîke û dibêje ev mesele divê ji alî wan ve bê lêkolîn (Selîm, 1919a, r. 5). Ev gotinên Memduh Selîm ji alî hin kesan ve hatine sehkirin ku em di hejmara 23an de dibînin ku Memduh Selîm nivîsara xwe de behs dîke 31ê Tebaxê ji alî Kûrd Tamîm-î Maarîf ve Neşrîyat Cemîyetî ve Roja Netewî a Kawa hatiye pîrozkirin. Selîm dawîya nivîsa xwe de jî beşek ji bo Kawa veqetandîye ku tê de behsa serhildana Kawa û alaya Kawa dîke (Memduh Selîm, 1919b, r. 5).

Di *Jinê* de kurtewergereke beşa Kurd û Kurdistanê ya *Encyclopedia Britannicayê* jî heye, ev kurtewerger ji alî Mehmed Sakîn ve hatiye kirin û wek rêzewerger di sê hejmarên *Jinê* de di hejmarên 10., 11. û 12. de cî girtiye. Dema li naveroka wergerê bê nêrîn derbarê Kurd û Kurdistanê û dîroka wan de agahiyên giştî tên dîtin. Lê ji analîz û şîroveyên kûr dûr in. Dîsa

gelek agahiyên hatine dayîn ji çavekî derveyî ne. Em dibînin ku Mehmed Sakîn bi helwesteke zanistî tevgeriyaye û otosansûrê neşixûlandiye, dest nedaye tiştên leh û aleyhê de.

Kurdiyê Bitlîsî di heman demê de bi rêya wergeran jî tevkarîya lêkolîna dîroka Kurdan kiriye. Bitlîsî di wê nêrînê de ye ku çavkaniyên biyanî de gelek agahiyên çewt hene û ji bo tesbîtkirina wan divê ev xebat bîr wergerandin. Bi vê mebestê ew wergêra berê xwe Mehmed sakîn pîroz dike û ew bixwe jî ji pirtûka Henry Mathieu ya bi navê “La Turquie et Ses Differentes Peuples” beşeke derheqê Kurdan de werdigerîne. Ferqa uslûba Bitlîsî ji ya Mehmed Sakîn ew e ku Bitlîsî wergerê ne tenê ji bo veguhaztina agahiyan bi kar tîne. Ew him werdigerîne him jî agahiyên ravekar li bin metnê dinivîse, eger agahiyek şaş hebe di metnê de destnîşan dike û rastiya wî vediguheze.

Di kovarê de ne tenê dîroka dûr herwiha dîroka nêzik jî hatibû nivîsîn. Kesê di vê mijarê de bi hûrgilî tevgeriyabû Law Reşîd bû. Law Reşîd serhildaneke dîroka nêzik, serhildanekî berî 6 salan lêkolabû û bi navê “Bir Tarih Olayı” nivîsibû. Wî ev lêkolîna xwe wekî berpirsiyarîyekî dîtîbû û xizmeta dîrokî bi cî anîbû. Serhildana ku Law Reşîd bi hûrgilî veguhaztibû nivîsê, îro bi navê Serhildana Bîdlîsê a 1914’an tê binavkirin. Heke mirov berê xwe bide nivîsa Law Reşîd, helwesta wî ya serkeftî û objektîf dertê holê. Wî bi hûrgilî ji serî heta binî serhildanê kolaye û nirxandinên ravekar kiriye. Ligel vê jî karakterên sereke yê serhildanê jî daye nasîn û analîzekî kesayeta wan jî kiriye ku mesele baştir bê fehmkirin (Reşîd, 1919a; 1919b). Herçiqas bê fikirîn ku hê ji ser bûyerê zêde derbas nebûye û mimkûn e ku Law Reşîd aligir tevgeriyabe û hin tiştan veşartibe an nedîtibe jî, xebatên pêbawer ên derheqê mijarê de nîşan didin ku Law Reşîd bi hessasiyeta dîroknûseke rastgo tevgeriyaye. (Ji bo lêkolîneke arşîvî a Serhildana Bîdlîsê ya 1914’an li Demirtaş, 2018an binêrin).

Di nav perên Jinê de dîrok ne tenê di nivîsaran de cî digire, ji bilî nivîsaran di helbestên Lahûtî de em rastî dîroka Kurdan tên. Lahûtî yek ji kurdên Rojhilat e û di wan salan de wekî sirgûnî li Stenbolê dimîne. Ji bo Jinê du helbestan dişîne, helbestên wî ji helbestên hunerane zêdetir helbestên armançbar in. Diyar e Lahûtî xwestiye ku Kurdên Osmanî ji Osmanî zêdetir xwe wek Îranî binasin. Di helbestên wî de ev fikr diyar e. Heta ew Kurdan wekî perçeyek mezin a Îranê dibîne (Arslan, 2017, r. 140). Tabî ji vir qesd ne dewleta Îranê ye, qesd nijad û coğrafyaya Îranê ye. Li gor wî ew kesê ku dibêjin Kurd ji Îran cûda ye, ew an xainê Kurdan e, an jî dîn e. Îran wek bedenekî ye û Kurd jî milê wî bedenê ne, heke dest ji beden cuda be bêkêr e, mirî ye. Kurd Medî ne û ji neslê padişahên Îranê ne (Lahûtî, 1919a, r. 15). Li vir Kurdan wekî milê Îranê dibîne di helbesta bo Nejada Kurd de jî dibêje Kurd qelbê Îranê ne. Kurd her Îranî û Îranî her Kurd in (Lahûtî. 1919b, r. 20). Diyar dibe ku fikra Lahûtî ji nivîskarên din ên *Jinê* cudatir e.

Nivîskarên li terîtoryaya Osmanî de mezinbûyî berê zêdetir xwe bi Tirkan re xwedî heman qederê dihesibandin, lê rasterast nehatibe gotin jî paşî ev fikra yekitiya qederê ji hev hatibû cudakirin. Li ba Lahûtî yekitiya qederî, ya Kurd û Îraniyan e. Li vir dikare bê gotin ku derdor û perwerde sînoren texeyyula rewşenbîrên Kurd diyar kiriye, lê di heman demê de Lahûtî vê texeyyulê bi hebûna dîroka hevpar piştrast kiriye.

Di hejmara dawîn a *Jînê* de nivisareke dîrokî heye ku bi sernavê Mihemed Axayê Kelhokî hatiye nivîsîn. Mihemed Axayê Kelhokî di dîroka Mîrektiya Bidlîsê de şexsîyeteke girîng e (Şerefhan, 1971, r. 450). Berî ku nivîskar behsa Kelhokî bike, dibêje ez ê pêşî behsa mîrektîya Bidlîsê bikim û derbarê mîrektiya Bidlîsê de ji Şerefnameyê agahiyên kurteyî vediguheze. Nivîs berî derbasî mijara Kelhokî bibe diqede. Dawiya nivîsê de hatiye diyarkirin ku ê dewama nivîsê hebe lê ji ber ku hejmarên paşî li ber dest nînin an nehatine weşandin em navê nivîskar û hûrgiliyên meseleyê hîn nabin.

ENCAM

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem hişmendîya rewşenbîrên Kurdan ji gelek aliyan ve guherîbûn. Hişmendîya wan a fikrî û hîsî ji qedereke hevpar a Kurd û Tirkan dûr ketibû û rewşenbîran xwe zêdetir nêzîkê fikra neteweperestîyê kiribû. Ev hêst û ramanên wan ên nû herî zêde xwe di nivîsên wan de nîşan didan. Ji ber ku wan xwe zêdetir nêzîkê neteweperwerîyê kiribûn û dixwestin nasnameya netewî ya Kurdan ava bikin, berê xwe dabûn dîrokê. Çimkî hebûna neteweyeke ji netewên din cudatir hewcetî bi dîrok û kokeke cuda hebû. Lê ev hewldana nîşandana dîrokeke cuda di heman demê de ji ber înkarekî jî pêk dihat. Li hember tunedîtînekî, hewldana tesbîtkirina kok û dîrokekî cuda wekî mecbûrîyetekî jî derketibû pêşîya rewşenbîrên Kurd. Ji bo rêçên vê hewldanê bîr nîşandayîn çavkaniya herî sûdemend Kovara Jinê ye. Rewşenbîran fikrên xwe di *Jînê* de nivîsîbû. Gelek kesan derbarê dîroka Kurdan de nivîsîbû. Di mijara dîrokê de kesê herî berhemdar Kurdîyê Bitlîsî bû. Bitlîsî bi nivîsên xwe nîşan dabû ku kok û dîroka Kurdan digihîje Îraniyan û Kurd Îranî ne, divê dema dîroka Kurdan bê lêkolîn Dîroka Îraniyan bê lêkolîn û li ser vê bingehe hebûna Kurdan bê nîşandan.

Ji bilî Kurdiyê Bitlîsî gelek kesan derbarê dîrokê de nivîsîbû. Dîroknûsîna wan jî dîsa bi armanca tesbîtkirina kok û dîrokeke cuda ya Kurdan bû. Nivîskarên *Jînê* gelek ziman dizanîn, dikaribûn him ji çavkaniyên Rojavayî him jî ji çavkaniyên rojhilatî sûd wergerin. Di nivîsên xwe de ji bo angaşten xwe rave bikin serî li wan çavkaniyên biyanî didan û car caran rasterast ew çavkanî werdigerandin.

Rojên ku weşana *Jinê* berdewam bûn, hin agahî dihatin guhê rewşenbîrên Kurdan ku lobîya Ermenan ji bo bi destxistina bajarên Kurdan bi dewletên mezin re hevdîtinan pêk dîanî. Yek ji motivasyonên nivîsên dîrokî jî ew bû ku li hember tezên Ermenan ku gelek bajarên Kurdan di nav Ermenistanê de dihesibandin û hewl didan ku van bajaran di nav sînorên Ermenistana dahatûyê de nîşan bidin. Ji ber van angaştan nivîskarên *Jinê* hewl dabû ku nîşan bidin nifûsa Kurdan a li van bajaran zêdetir Kurd in û Kurd bûn. Yegane nivîsa Kamran Alî Bedirxan di vê mijarê de bû ku wî dixwest li gor prensîbên Wilson Kurd li heqê xwe bigerin û statuyekî bistînin. Dema hemû nivîsarên dîrokî yê *Jinê* bên nirxandin tê dîtîn ku rewşenbîrên Kurdan wê demê berê xwe dane neteweperwerîyê û bi çavkaniyan xwestine ku dîroka Kurdan a cuda nîşan bidin û hebûna Kurdan a halêhazir destnîşan bikin. Lêkolîna van nivîsaran rê dide ku guherina hişmendiya dîrokî ya rewşenbîrên Kurd bê tesbîtkirin û di nivîsandina dîroka rewşenbîrî û neteweparêziya Kurdan de bergehên nû bîn tayînkirin.

ÇAVKANÎ

- Açar, C. (2018). *Tarih-i Kurd adlı yazma eserin çevirisi ve değerlendirilmesi*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans) Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Alan, A. (2015). *Hetawî Kurd 1913-1914 (değerlendirme-transkripsiyon)*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans) Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Alan, R. (2021). Rexne, wek naverokeka nûjenîyê (li ba ronakbîrên Kurd ên dewra Stenbolê helwesta rexneyî). *Kürd Araştırmaları Dergisi*, (5), 46-66.
- Aydın, S. (2014). Kürdler ve Habil Adem. Di nav D. Friç, *Kürdler*, (s.VII-XXII). Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Aykaç, Y. (2022). Nivîskar û rewşenbîrên ji Silêmaniyê û malbata Babanzade di rojnameya Kurd Teawun û Teraqî de. Di nav Î. Özçoşar, A. Karakaş, U. Yiğiz, M. Atsız (Ed.) *Babânzade Ahmed Naim (ailesi ve ilmi kişiliği)*. (s. 143-161). Divan Kitap.
- Bedirxan, K. A. (1919, 16 Ocak). Kürdler ve Kürdistan. *Jîn*, (9), 6-9.
- Benlisoy, B. & Benlisoy F. (2002). Milliyetçi tarih yazımı ve “azgelişmişlik bilinci”: Yunan tarih yazımında geçmiş algıları. *Toplum ve Bilim*, (91), 242-279.
- Berger, S. (2007). Introduction: towards a global history of national historiographies. İçinde Stefan B. (ed.), *Writing the nation-a global perspective*, (s. 1-30), Palgrave Macmillan.
- Beşikçi, İ. (2014). Alman şarkiyatçı Friç ve kitabı üzerine. Di nav D. Friç, *Kürdler*, (s. 209-214), Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Bitlîsî, K. (1918a, 7 Kasım). Muhacirin müdiriyeti yayınlarından Kürdler münasebetiyle Zehak efsanesi. *Jîn*, (1), 7-11.
- Bitlîsî, K. (1918b, 14 Kasım). Kürdler münasebetiyle. *Jîn*, (2), 1-6.
- Bitlîsî, K. (1918c, 21 Kasım). Kürdler münasebetiyle. *Jîn*, (3), 1-4.
- Bitlîsî, K. (1918d, 25 Aralık). Kürdistan'daki şehirler meskunesi Türk müdür?. *Jîn*, (6), 1-9.
- Bitlîsî, K. (1919a, 8 Mayıs). Kürdler İranî değil midir?. *Jîn*, (18), 1-8.
- Bitlîsî, K. (1919b, 22 Mayıs). Kürdler İranî değil midir?. *Jîn*, (19), 5-8.
- Bitlîsî, K. (1919c, 18 Haziran). Kürdler İranî değil midir?. *Jîn*, (21), 9-11.
- Bitlîsî, K. (t.t. 1919, Mart). Kürdçeye dair. *Jîn*, (s.y.), 10-14.
- Bozarslan, H. (2005). Türkiye’de (1919-1980) yazılı Kürt tarih söylemi üzerine bazı hususlar, içinde Abbas V. (ed.), *Kürt milliyetçiliğinin Kökenleri*, (s. 35-62), Avesta Yayınları.
- Bozarslan, M. E. (1985). *Jîn-kovara Kurdî-Tirkî*, Weşanxana Deng.
- Carr, E. H. (2016). *Tarih nedir?* (Çev. M. G. Gürtürk). İletişim Yayınları.
- Celîl, C. (2000). *Kürt aydınlanması*. Avesta Yayınları.

- Demirtaş M. (2018), 1914 tarihli bitlis isyanının osmanlı arşiv belgelerindeki yansımaları-cezalar, mükâfatlar, *Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 7(2), 432-492.
- Dr. Friç, (2014). *Kürdler*. Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Duman, G. (2013). Komeleya Hêvî ya xwendekarên Kurd û kovara Rojî Kurd-tevgerên komelebûnê beriya komeleya Hêvî ya xwendekarên Kurd. İçinde Koma Xebatên Kurdolojîyê (Haz.) *Di sedsaliya wê de Rojî Kurd* (r. 21-35). İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları.
- Feyzî, E. (1919a, 28 Ağustos). Baban Kürdlerinde kabiliyet-i harbiye. *Jîn*, (23), 5-7.
- Feyzî, E. (1919b, 2 Ekim) Baban Kürdlerinin kabiliyet-i sanayiye ve ilmiyeleri. *Jîn*, (25), 10-13.
- Haydarîzade, İ. (1918, 7 Kasım). Bir hasbîhal. *Jîn*, (1), 3.
- Hobsbwam, E. J. (1997). *On history*. The New Press.
- Issı, M. (2021). *Kürt milliyetçiliği ilk Kürt gazetelerinde siyasal kavramlar ve İslam [1898-1918]*. Peywend Yayınları.
- Kürdoloji Çalışmaları Grubu. (2022). *Süleymaniye'den İstanbul'a bir Kürt aydını Emin Feyzi Bey'in hatıraları*. Nûbihar Yayınları.
- Lahûtî. (1919a, 28 Ağustos). Le ber rûhî Kurdepiçûkan. *Jîn*, (23), 10-11.
- Lahûtî. (1919b, 2 Ekim). Bo nejadê Kurd. *Jîn* (25), 18-21.
- Özcan, A. (2013). *İmparatorluk çökerken yeni bir ulus tahayyülü Kürt milliyetçiliğinin yayın organı "Jîn" (1918-1919)*. Lotus Yayınevi.
- Pertev, R. (2018). Folklor û nasnameya kurdî ya neteweyî (1898-1946). Avesta Yayınları.
- Reşîd, L. (1919a, 10 Nisan). Bir hikaye-i tarih. *Jîn*, (16), 10-12.
- Reşîd, L. (1919b, 26 Nisan). Bir hikaye-i tarih. *Jîn*, (17), 10-17.
- Selîm, M. (1919a, 10 Nisan). Eyyam-ı mahsusamızı tesbit meselesi. *Jîn*, (16), 5-8.
- Selîm, M. (1919b, 2 Ekim) Kave yevm-i mahsusi. *Jîn*, (25), 4-5.
- Serfiraz, M. (2017). Lahûtî Xanê Kirmaşanî: salên wî li Stembolê û tékiliyên wî bi derdorên Kurdî re (1918-1919). *Derwaze*, (1), 140-146.
- Smith, A. D. (2002), *Ulusların etnik kökeni*. (Çev. Sonay B. & Hülya K). Dost Kitabevi.
- Şerefhan, (1971), *Şerefname-Kürt tarihi*. (Çev. Mehmed Emin B.). Ant Yayınları.
- Şilanlızade, Y. S. (1919a, 10 Mart) Kürdler tarihi bir millettir-1. *Jîn*, (13), 3-6.
- Şilanlızade, Y. S. (1919b, 8 Mayıs) Kürdler tarihi bir millettir-2. *Jîn* (18), 9-11.
- Tewfiq, S. (1918a, 28 Kasım) Jîn mecmuasi vasitesiyle Kurdîyê Bitlîsî kardeşime, *Jîn*, (4), 1-4.
- Tewfiq, S. (1919, 2 Ocak) Jîn mecmuasi vasitesiyle Kurdîyê Bitlîsî kardeşime-2. *Jîn* (7), 1-4.
- Tunaya, T. Z. (2003), *Türkiye'de Siyasal Partiler-Mütareke Dönemi*. İletişim Yayınları.

- Vali, A. (Ed.). (2005). *Kürt milliyetçiliğinin kökenleri*. (Çev. Fahriye A. & Ümit A. & Sema K.). Avesta Yayınları
- Wedad, S. İ. (1919a, 9 Ocak) Kürd türk birliğı. *Jîn*, (8), 1-3.
- Wedad, S. İ. (1919b, 16 Ocak) Kürdçe lisanımız. *Jîn*, (9), 9-12.
- Yamûlkîzade, A. (1918, 12 Aralık). Kürd ne idi ne ister. *Jîn*, (5), 1-3.
- Yamûlkîzade, A. (1919a, 16 Ocak) Kürd tarihinden Baban hanedanı. *Jîn*, (9), 1-6.
- Yamûlkîzade, A. (1919b, 10 Mart) Kürd tarihinden Baban hanedanı. *Jîn*, (13).6-10.